Ji Penûsê Jinê Rastiya Jiyanê

RAPERÎN

Dîrok: Sibat 2024 **Hejmar: 11** **Biha: 1000**

ŞOREŞA JİNÊ NE HÊSAN E LÊ SERKEFTİN TEQEZ E

BIJÎ 8Ê ADARÊ BIJÎ SOSYALÎZM

NÊRÎN 3 Bijî Şoreşa Jinê û Sosyalîzm

JIYANNAME 4 Wêrekîya Serûbînkirina Jiyanê Yasemîn/Zîlan

DOSYE 6 Derbaseya Nezerîya Şoreşa Jin -2-

Bijî Şoreşa Jinê û Sosyalîzm!

Pergala serdestîya mêr, kapîtalîzm, kûrewîbûna emperyaliyetê dewletên faşîst û burjuva, êrîşkarîya dagirker û mêtînger derveyî kuştin, birçîbûn, feqîrtî, tundî û şer nikare tiştekî bide jinan. Û em mecbûr in li dijî ev pergala zilmê rêxistin bibin û em serkeftina şoreşê û sosyalîzmê bi ser bixin. Ji ber vê yekê em dibêjin "Şoreşa Jinê ne hêsan e, lê serkeftin teqez e."

Dijmin bêrûmetî, radestî, serî tewandin û jiyana koletî ferzî jinan dike. Bersiva me jî bi koçberbûn, terikandina axan û revîna derveyî welat weke rastîyeke din a herêma me berdewam dike. Yên ku koçber dibin di rêyên koçberîyê de rastî sexteksrî, hadis, mirin, tacîz û destdirêjîyê tên. Li welatên ku diçin jî pirsgêrêkên aborî û jîyanî, zordestîya sîyasî û zilm di astên cuda de berdewam dike. Divê jin nebin inwana revînê, berevajî bibin inwana berxwedan û welatparêziyê.

Di pêvajoya ku em tê re derbasbûn de komxebata şoreşa jin a ku JKŞê, hemleya bi hedefa şaredarîvanîyeke demokratîk û ekolojîk dest bi xebateke sext kir. Di zindanan de bi daxwaza "Ji Ocelan re Azadî Ji Pirsgêrêka Kurd re Çaresarî" çalakîya girêva birçîbûnê ya dorveger a bi sedan girtîyan her ku diçe bandora xwe xurt dike. Di kolanan de çalakîyên piştgirîyê tên lidarxistin.

Li Filistînê rexmê şertên dijwar ên jîyanê li dijî zilma Îsraîla dagirker û sîyonîst ji 7ê Cotmeha 2023an heta îro berxwedaneke mezin berdewam dike. Şerê îrade yê şênber şerê Ûkrayna û Rûsya, li Rojhilata Navîn şerê li Sûrî, Yemen û hwd. dîsa pevçûnên aborî yên di navbera Emerîka û Sîn, Emerîka û Rûsya, derbeyên leşgerî yên li parzemîna Efrîqayê hwd. ji îro de bingeha şerê cîhanê amade dike. Lê di alîyê din de di seranserî cîhanê de di encama kûrewîbûna emperyalîtê de tundîya cinsî, fizîkî, aborî, psîkolojîk û hwd. her ku diçe mezintir dibe. Kuştinên jinê êdî gîhaştîye asta komkujî, bi mîlyonan zarok û jin ji birçîna jiyana xwe ji dest

bi dirûşmeya "jiyan berxwedan e" rêxistinbûn, li Kurdistan û Rojhilata Navîn pêşxistina şoreşa jin û sosyalîzmê ye. Em di van şertan de amadekarîya 8ê Adarê û cejna Newroza ku roja vejîna gelê Kurd ê dikin.

Em di destpêka sala 2024an de ne. Rêveberîya me ya Xweser a Demokratîk a Bakur û Rojhilata Sûrî di bin êrîşên dewleta Tirk a burjuva ku siyaseta mêtîngerîyê dişopîne de erkên xwe yên siyasî, rêxistinî û parastinê berdewam dike. Hevpeymana civakî ya nû îlan kir. Em bi biryardarîya derbaskirina êrîşên li ser binesazîya herêma me, qadên aborî, saziyên ewlehîya hundirîn, kadroyên pêşeng ên şoreşê, jin, gel, zarokan parastin û avakirina şoreşa xwe berdewam dikin.

Çavkanîya sîyaseta embergoya aborî ku dewletên burjuva ên kapîtalîst disepîne, sîyaseta dolar ku nirxa lîreyê Sûrî dixe û çavkanîya pirsgêrêkên ku statûya resmî ya Rojava qebûl nake, di esasê de dewletên hevkar ên paşverû û emperyalîzm e. Dîsa mînakên ewlehîya hundirîn a ku li qempa holê li dijî DAÎŞê hatîye lidarxistin, di tevahîya xeta sînor de çalakîyên Hêzên Rizgarîya Efrîn bûn mînakên pêşketî yên berxwedana Rojava. Li dijî êrîşên sûîqestê yên bi balafirên bêmirov ên li dijî jinên pêşeng û li dijî êrîşa Zelal Zagros ku bi destê istixbarata Tirk hat qetilkirin bi çalakîyan bersiveke xurt hat dayin û li dijî serdestîya mêr û mêtîngerîyê hat sekinîn.

Bi hêrsê serhildana ku berî salekê hat jiyîn rejîma Îranê hin berxwêdêrên ku dîl girtîbû îdam kir. Li Îranê li dijî vê sîyasetê "girêva giştî berxwedana giştî" hat rêxistinkirin. Dîsa di zindana Evîn de 61 jinên girtî li dijî îdaman dest bi girêva birçîbûnê kirin. Hevalên têkoşînê yên Jîna Mahsa Emînî di şertên herî giran de, berxêdêrîya xwe ya polîtîk û pêşengtiya xwe berdewamkirin.

Li Tirkiye û Bakurê Kurdistanê amadekarîya hilbijartina şaredariyan a 31ê Adarê tê kirin. Dem partîyê dost ji bo ku şaredariyên ku ji alîyê faşîzma AKP û MHPê ve hatine destesarkirin ji nû ve bistîne di navbera hêzên emperyalîst, dewletên herêmê yên paşverû û hêzên berxwedanê de bi belavbûna seranserî Rojhilata Navîn her ku diçe tundtir dibe. Berxwedana gelên Kurd û Filistînê yê ku serî natewîne, weke hîmên federasyona Rojhilata Navîn a pêşerojê rola xwe ya dîrokî careke din nîşandan.

Erê ji Efxanîstanê heta Îranê, ji Belûcîstanê heta Filîstînê, ji Kurdistanê heta Tirkiye, Filipînler, Emerîkayê, ji Asyayê heta Ewropayê û cîhanê jin bi daxwazên azadî, wekhevî û edaletê deng û çalakîyên xwe bilind dikin. Li Rojava jî, şoreşa me ya jîn bi al, dirûşme û sîleha xwe mewzîyên pêş ên berxwedanê digire û bûyîna çavkanîya moralê berdewam dike.

Di tevahî cîhanê de îro zengilên şerê cîhanî yê sêyemîn lê dide. Dewletên emperyalîst dixwazin cîhanê ji nû ve parve bikin. Dewlet û hêzên emperyalîst jî ber berjewendiyên xwe dixwazin tevahî cîhanê ji nû ve bixin hundirê şer. Mînakên vê yên herî didin, bi mîlyonan jinên koçber rastî tacîz, destdirêjî û her cure tundiyê tên. Li dijî vê jî di asta cîhanê de berxwedan û têkoşîna jinan mezintir dibin. Ji niha di her qorziyê cîhanê de jin bi daxwazên wekhevî, edalet, azadî, jiyaneke birûmet, ji bo karê wekhev mûçeya wekhev, dîsa bi daxwazên azadîya polîtîk, cinsî, çînî û neteweyî amadekarîya 8ê Adarê û girêva jinê dikin.

Em di van şertan de 8ê Adarê pêşwazî dikin. Di 8ê Adara ku roja îcaze ya bimûçe ye em dakevin qadan. Di cejna Newrozê de em li derdora agirê azadîyê yê gelê Kurd em bikevin dîlanê. Em hêza piştgirî û yekîtîya gel û jinên Kurd, Ereb, Suryan, Asurî, Ermen, Tirkmen, Çerkes, Çeçen, Xiristiyan, Êzîdî, Misilman mezin bikin. Em şoreşê bixin hundirê malan. Em keda xwe hapsî hundirê malan nekin. Em keda xwe ji bo pirsgêrêk û pêwîstîyên şoreşê seferberî xebatên civakî û leşgerî bikin. Em di refên JKŞê de hêz bidin têkoşîna yekbûyî ya jinan.

JKŞ Komxebata Şoreşa Jinê Pêk Anî

JKŞ li Hesekê bi dirûşmeya "Şoreşa Jinê ne Hêsan e Lê Serkeftin Teqez e" komxebata şoreşa jinê lidar xist. Di berfirehiya amadekariyê de bi rêya mesaj û dîmenan jinên ji Rojhilata Navîn û welatên cîhanê û ji pê ve bi serlêdana sazî û rêxistinên jin hatin dawetkirin.

Komxebata ku Nûnerên Saziya Yekîtî û Piştgiriya Gelan (SYPG), Partîya Nûjen, Partîya Yekîtîya Suryanan, Kongreya Îslama Demokratîk, Partîya Guhertin ê Demokratîk û Rêxistina Sara jî tevlî bûn, Jinên ji Yekîtîya Jinên Sosyalîst a Ewropayê, Zora, Yekîtîya Jinan a Chiaps a Meksîka mesaj şandin.

Komxebat Weke 3 Runiştin Hat Lidarxistin

Di rûniştina yekemîn a di bin serenavê "Sedsala 21emîn çima sedsala şoreşên jinê ye" de bal hat kişandin ser hevkarîya di navbera pergala kapîtalîst û serdestîya mêr. Lê di heman demê de di navbera her du diyardeyan de nakokî jî heye. Di demên kevin de jinên ku dixebitîyan dihatin eyibandin. Niha xebitîna jinê tê qebûlkirin. Lê di heman demê de tê payin ku jin hem derve bixebite, hem jî xizmeta kal û pîran, zarok û malê bikin. Jina ku pere tîne malê bi mêr vê ber bi heman pozîsyonê ve tê. Lê vê rastiyê ne mêr, ne jî pergala kapîtalîst qebûl dike. Di encama vê de, nakokîyên di navbera bendewarîya mêr û civakê û rewşa jinê ya nû de her ku diçe kûrtir dibe.

Ev nakokî di heman de bingeha şoreşa jinê amade dike. Ji ber ku jin êdî wekî kevin naxwazin wekî bûk, hevjîn an jî dayika kesî bên naskirin, dixwazin bi navê xwe bên naskirin. Naxwaze ku wekî diya Agirî bê naskirin dixwaze weke heval Leyla bê naskirin. Dixwaze bi vî rengî di cavakê de bibe mafa gotin. Ew wekhevî, edalet û azadî dixwaze. Lê pergala kapîtalîst, feodal a kevnare destûr nade vê, nikare bide. Ji ber vê yekê di aliyekî de ji bo ku keda wê îstîsmar bike wê dikişîne nav xebatê, lê di alîyê din de jî ji bo ku bibe "jina mala xwe" wê her cure dext û zordestîyê disepîne. Jin çima di nav pergaleke wisa de bibin kole? Ji vê re dibêjin na û ji ber vê yekê daxwaza şoreşê dikin!

Di Her Şoreşê de Tifaq Girîng in

Têkoşîna li dijî pergala baviksalar di heman demê de pêvajoya mirovbûna mêr e jî, û şoreşa jinê pêşengê tevahî têkoşîna çînên bindest û têkoşîna rizgarîya navneteweyî ye. Ji ber vê yekê divê şoreşa jinê li dijî îstîsmarîyê bi mêran ve mil bidin hev. Divê em tecrûbeyên pêşketî û kêmasiyên destpêkê şoreşa cotmehê û şoreşên sedsala 20emîn weke tecrûbeyên xwe bibînin û encam derxin.

Di rûniştina duyemîn a di bin serenavê "Li Cîhanê û Rojhilata Navîn Têkoşînên Azadîya Jin" de nîqaşên berfireh hatin meşandin. Di sedsala 21emîn de serdestîya mêr û kapîtalîzma ku di merhaleya kûrewîbûna emperyaliyetê de ye hîna zêdetir derbasî nav hev bûye. Li her derê faşîzm, Paşverûtî, zayendperestî, şerên dagirker û mêtînger hîna zêde bûye. Pergala a kapîtalîst a serdestîya mêr li dijî jinê jî şerekî mezin dide meşandin. Di alîyê din de jin li dijî van êrîşan têkoşînên di asta şexsî, kolektîf, cîgayî, herêmî, parzemînî û cîhanî de têkoşîna xwe mezintir dikin. Girêva jinan a ku li dijî tundiyê û mûçeya newekhev, têkoşînên li dijî qedexeya kurtajê di seranserî cîhanê de bandor li pêşketina zanebûna zayendî kir. Li Rojhilata Navîn pergala koletiyê û şoreş pêv diçe.

Li Rojhilata Navîn jin ji mafên herî bingehîn mehrûm in. Ligel vê sinetên jinê, komkujî, destdirêjî û tundî bi awayekî gelekî zêde tê jiyîn. Li Sûrî, Bakur û Rojhilatê Sûrî, Filîstîn û hwd. ji ber şerên mêtînger û dagirker jin rastî her cure êrîşên fizîkî û cinsî tên. Jin li ser axên ku koçber dibin ji çand û zimanên xwe dûr dikevin, jin ji civakîbûna xwe tên qutkirin.

Lê di alîyê din de jî têkoşînên azadîya jin ên herî pêşketî li ser van axan derdikevin holê, Li Rojava şoreşa jinê pêk hat. Di sala 2011an de di serhildanên gel de jinan di refên herî pêş de cih girtin. Jin li Efxanîstanê li dijî Talîban bi bedêlên giran têdikoşin. Di sala 2022an de piştî qetilkirina Jîna Emînî li Rojhilata Kurdistanê û Îranê bi pêşengtiya jinan bi mehan serhildan hatin jiyîn.

Îro têkoşîna jinan a çekdarî jî gelekî girîng û diyarker e. me ev di şoreşa Rojava ya jin de jî dît. Di cîhanê de li Filipîn, Hîndîstan, Kolombîya, Tirkiye û çar parçeyê Kurdistanê jin weke yekîneyên gerîla şer dikin. Hebûn û çalakiyên Tevgera Şoreşê ya Yekbûyî ya Jin wê ji bo şoreşa me ya herêmî roleke girîng bilîze. Berxwedana gerîlayên YJA star îlham didin jinan.

Em konferansa 3emîn a Rêxistina Jinên Komunîst ku di demekê nêzik de hat îlankirin silav dikin em bawer dikin wê biryarên ku hatin girtin û perspektîfên ku ji konferansê derketin wê tevkariyeke gelekî girîng bide têkoşîna azadîya jin. Di cîhanê de têkoşîna azadîya jinê gîhaştîye asteke girîng. Lê îro hem di cîhanê de, hem jî di Rojhilata Navîn de pêwîstî bi rêxistinbûna jinan a enternasyonal heye. Pêwîst e ku bi tecrûbeyên şoreşa Rojava ya jin ev têkoşîn hîna zêdetir bê bilindkirin. Li dijî şerê berfireh ê ku li dijî jinê tê meşandin divê jin sîleh rakin û girseyên jin bên bi sîlehkirin.

Pirsgêrêkên Pêşketina Şoreşa Rojava

Di rûniştina 3emîn a bi serenavê "Pirsgêrêkên Pêşketina Şoreşa Rojava" de hat anîn ser ziman ku di şoreşa Rojava de nûnertîya wekhev û rêxistinên xweser hatine avakirin. Di nav şoreşa Rojava de jin li derve bixebitin jî mecbûr in ku hemû karên malê jî bikin. Barê ser milê jinê du qet zêdetir dibe. Divê şoreşa me ji îro de hin çaresarîyan biafirîne. Rawdayên zarokan, cilşoxane û mitfaxên dikarin bên vekirin.

Jîyana jinan îro jî bi destê ol, eşîr û malbatê tê sînordarkirin. Biryara ku jin çend zarok biweledinîn, kürtaj bibin an jî nebin mêr didin. Çanda eşîrtî û malbatî bi taybetî bi taybetî dibe sedema kuştina jinên ciwan. Tê xwestin ku jin tenê di hundirê malê de bimînin, fikir û ramanên nû nas nekin.

Em şoreşa me ya ku dewleta Tirk a faşîst û dewletên paşverû yên herêmî dixwazin hilweşînin tenê dikarin bi mezinkirina têkoşîna xwe biparêzin. Me heta niha ji bo şoreşa xwe têkoşînên mezin dan meşandin û pêwîst e ku em hîna zêdetir bikin. Ji ber ku em ji bo rizgarîya tevahî jinan şoreşa cîhanê dixwazin.

Komxebat bi dirûşmeya "Bijî Şoreşa Jinê" û strandina strana Şewra ya erebî bi dawî bû.

Wêrekîya Serûbînkirina Jiyanê Yasemîn/Zîlan

Emrê xwe yê kinikî têra dilê xwe jîya hevrê Yasemîn. Wê bi şewitandina nasnameya xwe, xwe gîhand nasnameyeke nû ya jineke ciwan û azad. Ew ji Yasemînê vegerîya Zîlan. Ew weke jineke ciwan a komunîst li dijî desthiladarîya dewleta mêr a faşîst û mêtînger bû ala azadîyê. Li dijî tarîtîyê û ji bo ku tarîtîya şevê ronî bike di Sibata 2012an de bû denga tevahî jinên ciwan û di mêjîya dijmin de teqîya û cîhan sor kir.

Di Sibata 1989an de li bajarê Edeneyê ji dayik bûye. Malbata wê malbateke kedkar ku ji bajarokê Sîwerekê yê Rihayê koçberî Edeneyê bûye. Di nav malbateke ku xwedî çanda kevneperest de mezin dibe. Ji ber vê sedemê hevrê Yasemîn di jîyana xwe de dexta kevneşopiyên feodal û avanîya eşîretê bi giranî dijî. Ev yek dibe bingeha lêgerîna wê ya azadîyê. Di bekelorîya Anafartalar a Edeneyê de naskirina wê şoreşgeran, naskirina wê ya ramanên şoreşger û azadîyê dabîn dike. Hîna di heyama bekelorîya de di nav komeke antî faşîst de rêxistin dibe û bi vî awayî ber bi jîyana şoreşgerî ve gav davêje. Bi coş û hestên xwe di demeke kin de xwe bi derdora xwe dide hezkirin. Di kolanên Edeneyê de tevlî çalakîyan dibe, belavok belav dike, poster dizelîqîne û her wiha bê sekn û bêwestan kar û xebatên cureyî dide meşandin. Di sala 2008an de piştî ezmûna zanîngehê, zanîngeha Mustafa Kemal a Hatayê qezenç dike û êdî ji bo xwendina zanîngehê derbasî Hatayê dibe.

Êdî soz dayîbû xwe ku li Hatayê xwe ji nû ve biafirîne. Di salên 2008–2009an de li bajarê Hatayê berpîrsiyartîya Rêxistina Ciwanên Komunîst girt ser milên xwe. Ev ji bo wê qewastineke nû bû. Ji bo ku ji sînorên xwe yên qut bibe û şoreşgertîyeke bêsînor bide meşandin dikeve nava hewldaneke bêhempa. Di wê demê de malbata wê li ber têkoşîna wê astengî û sînorê herî mezin e. Ji ber vê yekê gava yekem di vî milî de davêje. Ji malbatê derdikeve û têkoşîna şoreşgerî bi vî awayî dimeşîne. Di sala 2010an de ji bo ku şoreşgertîya xwe mezintir bike gaveke duyemîn davêje û ji zanîngehê derdikeve û derbasî bajarê Stembolê (İstanbul) dibe. Li vir di dav kar û xebatên ciwanan de cih digire. Sal û nîvekê li taxa 1ê Gulanê teva gelê kedkar têdikoşe, kolan bi kolan digere û girseyan rêxistin dike.

Di vê pêvajoyê de di nav partîyê de bizavên tesfîyekar derdikevin holê. Bi taybetî beşek ji ciwanan dikevin bin bandora tesfiyekarîyê. Di bin bandora fikrên tesfîyekar de

dûrketinên ji têkoşîna çekdarî destpê dike. Beşek ji jinên ciwan dest bi vekişîna nav pergala malbat, têkîlîyên evînî yên paşverû û zewacê dikin. Hevrê Yasemîn jî di destpêka vê pêvajoyê de dikeve bin bandora vê û demekê ji têkoşînê dûr dikeve. Hewesî jiyana burjuva dike. Bi têkîlîyeke evînî ya paşverû dikeve bin bandora rolên jinbûnîya kevneperest. Lê di alîyekî de jî ew di navbera du nasnameyan de dikeve nav lêpirsîneke şoreşger. Êdî di ev pêvajoya jîyana xwe de pêwîst e ku biryarekê bide. An jîyana şoreşger û azadîya tevahî jinan, an jî azadîya şexsî ya ezezî. Wê an raperînek bikira an jî di nav rolên paşverû yên civakê de bima, an jî wê jiyaneke burjuva, an jî jiyana şoreşger hilbijarta.

Ji bo jîyaneke bêçîn û bêsînor dikeve nav şerekî bêhempa. Weke jineke komunîst, şoreşger û kadroyeke profosyonel hedefên xwe mezintir dike. Destpêkê de xwe ji ew têkîlîya evînî ya paşverû û hemû sînorên xwe qut kir û li dijî pêvajoya tesfiyekarîyê gava xwe ya sêyemîn avêt. Êdî tu tiştî nikarîbû wê bida sekinandin. Ji ber ku ji her tiştê xwe yê paşverû dûr dikeve, di jîyana xwe de çi tiştê eydî jîyana kevin hebe hildiweşîne û nasnameya xwe weke jineke komunîst a azad ji nû ve diafirîne. Gelo mirovê nû ne girtina ser milê xwe ya berpirsîyartîya avakirina cîhaneke nû ye. Gelo mirov dikare bêyî hilweşandina kevneşopiyên pergala kapîtalîst jîyaneke nû ava bike? Wê destpêkê li dijî çanda feodal a eşîrtî û malbatî serî hilda, li dijî faşîzmê û serdestîya mêr hilda, li dijî jîyana burjuva ku jinê tune dike û li dijî paşverûtîyên xwe yên şexsî serî hilda, li dijî rizandina bandorên tesfiyekarîyê yên ku şoreşgertiyê dirîzîne serî hilda, berê xwe da şer û têkoşîna bisîleh û weke jineke ciwan û wêrek erka avakirina jîyaneke bêsînor û bêçîn girt ser milên xwe.

Hevrê Yasemîn di pêvajoyeke girîng de destpêkê li dijî fêrbûnên xwe yên burjuva şer da destpêkirin û ji vî şerî serkeftî derket. Ji bo ku xwe ji qadên têkoşînê yên cuda re amade bike kedeke mezin da. Ew ligel nexweşîya xwe ya dil bi fidakarî û israreke mezin xebitî. Xwest ku bibe leşgerek wêrek. Ji bo rizgarîya gelên bindest berê xwe da têkoşîna bisîleh û ji bo tevahî jinan şer kir.

Partîyê xwe MLKP dema ku ew şehîd ket wiha nivîsand: *"Hevrê Zîlan, di wêrekîyê de jî nîşan da ku wê ji pêwîstîyên şer paş ve nemîne. Gotin di pratîka wê de vegerîya hêzeke madî (berçavî)"*

Berî ku biçe çalakîya xwe dawî di nameya xwe ku ji partîyê xwe re nivîsandibû wiha digot: *"Ez bi şer vekirina li dijî jinbûyîna kevneperest û hînbûyînên burjuvazîya bîçuk; wek şexsek ku bi hedefa bûyîna şervaneke azad û bûyîna jineke komunîst derdikeve rê vê nivîsê dinivîsim. Tam di demeke ku ez nakokîyên xwe bi awayekî xurt hîs dikim li dîwarê jinbûyîna civakî û qelsiyên xwe yên burjuvazîya biçûk diqelivîm û di pêvajoyeke ku ez paş ve ketibûm, min ber bi serûbinbûyînê ve gavek avêt. Dibe ku serûbinbûyîn ji bo jineke kevneperest û kesekî ku biryara jîyaneke yeknesak tirsnak were. Lê em ji ku dizanin ku binîyê jîyana me ji ser jîyana me ne baştir e?"* Hevrê Yasemîn bi van pirsan di jîyana xwe de rêya serûbinbunekê weke xetekê ava kir û xwe ji nû ve afirand.

Di dîroka 9ê Sibata 2012an de di rojbûna xwe de dema ku ber bi qerargeha dijmin ve diçû di encama teqîna bêwext a bombeyê de bû nemir. Hevrê Zîlan xwestibû ku rojbûna xwe li dijî partîyê faşîst ê AKPê yê Erdogan bi çalakîyekê pîroz bike. Di rojbûna xwe de bi weke Zîlan bi wêrekîyeke mezin êrîşî qerargeha dijmin kir. Çalakîya wê destpêkê bandor li jinên ciwan kir, piştî çalakîya hevrê Yasemîn gelek jinên ciwan tevlî refên partîyê bûn û ala wê bilind kirin. Hevrê Yasemîn bi xeyalên xwe û bi stêrkên di çavên xwe de rêya me, şeva me ronî dike.

Hevrê Zîlan ji jinên ciwan bangewazîya şkenandina zincîran û bangewazîya azadîyê ye. Hevrê Zîlan ji bo tevahî komunîstan bangewazîya hilweşandina sînoran e. Hevrê Zîlan bangewazîya nezirbûn, bilindkirina rihê fidayî û bilindkirina wêrekîya şoreşgerî ye. Soza me ji wê re serkeftin e.

BI RIHÊ JINÊN CIWAN EM Ê DÎROKÊ BIAFIRÎNIN

Di serî de weke ku tê zanîn di Rojhilata Navîn de civak piranî li ser eşîret, adet, çand ve tê nasîn.

civakeke baviksalar e ku di hundirê wê de jin weke amurek tê dîtin. Derveyî mêr jin weke kesayet an jî îradeyek nayê naskirin. Jin tenê di sêgoşeya malbat, eşîr û ol de tê pênasekirin. Ji bo vê jî her cure tundî li ser jinê pêkanîn ku jin nikaribe ji vê sêgoşeyê dernekeve. Lê pêwîst dibe em vê yekê nas bikin ku ev yek mêr jî ji mirovatiyê dûr dixe. Pergalên baviksalar yên ku heta niha li ser jîyana jinan biryar digire ku di bin navê adet û teqalîd de jîyana wê sînordar dikin. Ji xwendin heta kar bi gotina "tu keç e li mal be fêrî karê mitfaxê bibe" wê dixin zindana jiyana cahiliyetê de. Ji despêkê ve her biryarên li ser jinan li gorî çanda eşîret li gorî xurtkirina mêr tê tevgerîn.

Dema ku jin dixwazin bi îradeya xwe bi awayekî azad bijîn jî rastî kuştin û tundîyê tê. Ji ber ku ew jin ne sebixwe ye, namûsa jinê weke namûsa malbat, eşîr û civakê tê dîtin. Bav, bira û tevahî mêr ji namûsa jinê berpirsiyar tên dîtin. Ji bo ku jin şerefa malbat, eşîr û civakê tê dîtin û tevahî jîyana wê li gorî vê tê sererastkirin. Ger jinek rastî destdirêjîyê were ew jin sucdar dibe û tê qetilkirin. Li gorî vê ferasetê Ji ber ku nikarîbû parastina şeref u namûs xwe bike, ne li gorî adetên eşîret û malbata xwe meşî+

ya, êdî ew qirêj bû, pêwîst e ku ev qirêjî bê paqijkirin. Lê di rastiyê de yê herî qirêj pergal û çanda resmaliyetê ya tecawîzker a serdestîya mêr û feraseta mêrên ku li gorî vê hareket dikine. Ev tê gotin û dîtin ji ber ku mixabin sîstemeke ewqas paşverû zilamperest , jin weke mirovekî nade nirxandin, ew weke amûrek di destê mêr de dibîne, tenê ji bo çêkirina zarokan, hazirkirina xwarin tenê weke koleyek ji mêr re tê dîtin. Di heman demê de hebûna dewletên kapîtalîst u emperyalî roleke mezin ji bo parastin u mezinkirina civakên baviksalar dide lîskandin .

Weke ku tê dîtin di pergala kapîtalîzmê de jin hîn bêhtir bûye koleya mal, çand û civakê. Ev yek gelekî bandor li pêşketina jinan dike. Ji ber ku kapîtalîzm li gorî çanda eşîrtî hebûna xwe li ser koletîya jinê dide avakirin. Yanê tenê weke" meta " jin hat dîtin, li ser vê yekê em mînakek bidin, li xwaringehê dema ku hinek werin xwarin bixwazin, li ser laşê jinê ve ew xwarin didin pêş wan, heta ne tenê ev her dixwazin jin di warek din de bidin girêdan gelek riyên cuda didin pêş jinê, weke ku xwe bi tiştên madî yên xwe xapandin ve mijûl bike, tecmîl bike, makyaj çêke , cilên vekirî li xwe bike, ev yek dihêle ku bawerîya jin bi wê kêm bibe heman demê de ji bo ku azadîya jin di vê çarçoveyê de girêdin. Vê yekê hişt ku li hemû dinyayê jin dakevin qadan ji bo mafê axaftin li ser laşê xwe yani "laş laşê mine biryar biryara min e" yani em têkoşîna biryara li ser xwe, laşê xwe dixwazin, li gelek bajarên cuda jin hatin îdamkirin ji bo vê mafê weke bajarê Îran di bin navê "polîsên exlaq" de gelek jin hatin kuştin tenê ji ber ku li gorî biryara wan li ser bedenê wê nemeşîyan, gelek mijarên cur bi cur em dikarin bînin ser ziman.

Weke mijarên ku anha di derheqê jinên ciwan têne kirin, yên ku bêçare dimînin xwe bidin intiharkirin, zêdekirina xwekuştin li dijî destdirêjî pêk tê û bi navê "kuştinên namûsê" - ku dibe weke bersiva vê destdirêjîya, ev yek jî tundîya zayendî ye. Tevî ku jin li rastî tundîya zayendî tên lê dîsa jî jin dibe ya xwedî sûc, ev kiryarek êrîşkar tê hesibandin, armanc dike ku hêz û serwerîya li ser jin u zayenda wê eşkere bike, her wiha di dema ku hate gotin azadî her kes di jin fikrandinek wisa fikirî ku xwe di warê cinsî de bide avakirin weke cil û bergên kapitalîzm, lê azadîya cinsî ku her jineke bi zayenda xwe azad bijî .

Em dizanin ku bi taybetî ev kiryarên qirêj ên pergala kapîtalîst di destpêkê de li ser jinên ciwan tê ferzkirin. Ji ber tê xwestin ku jin hîna di emrê xwe yê zarok an jî ciwan de bên xistin bin nîra koletîyê. Pergala kapîtalîst şerê xwe yê li dijî jinan weke cinsî û çînî di du alîyan de dimeşîne. Li dijî vê pêwîst e ku di her derê de jinên ciwan bi rêxistinbûna xwe îradeya xwe xurt bikin û bibin pêşengên hilweşandina pergala kapîtalîst a serdestîya mêr. Êdî jin dixwazin ji hundirê ev sêgoşeya pergala kapîtalîst derkevin. Wekî ku em bi awayekî şênber dibînin di serhildan û şoreşên ku îro sedsala 21emîn de tên jiyîn jinên ciwan pêşengên van şoreş û serhildanan in. Me mînakên vê di serhildana gelên Ereb ên 2011an de, di şoreşa Rojava ya jin de, di serhildana Jîna Mahsa Emînî ya Rojhilata Kurdistanê de bi awayekî berbiçav dît.

Em kedkarên Çapxaneya Sîmav ên ku di êrîşa dewleta Tirk a dagirker û faşîst li ser bajarê me Qamişlo de nemir bûn, bi minetdarî bi bîr tînin. Wan ji bo rojnameyên me Raperîn û Serkeftin kedên mezin dan. Bîranînên wan wê di têkoşîna me de bidin jiyankirin.

DERBASEYA NEZERÎYA ŞOREŞA JIN -2-

Em di nivîsa xwe ya destpêkê de li ser bernameya hindiktirîn a şoreşa jin sekinî bûn. Em ê di vê nivîsa xwe de jî li ser bingeha heyberî ya şoreşa jin bisekinin. Em ê li avanîya yekbûyî ya navbera serdestîya mêr û pergala sermîyanê binêrin.

Şoreş çiye? Her şoreş pergala civakî ya kevin hildiweşîne, di vê wateyê de civakî ye. Her şoreşek desthiladarîya kevin tune dike, di vê wateyê de polîtîk e. Di heman demê de her şoreşek ji bo herikîna dîrokê mudaxeleyeke tundraw e.

Di dîrokê de serhildanên koleyan, serhildanên gundîyan pêk hatine lê ev negîhaştine wesfeke şoreşê. Di dîrokê de em mînakên herî pêşketî di şoreşên burjuva yên Fransayê de dibînin û dîsa mînaka herî pêşketî bi rêya şoreşa cotmehê de dibînin û dîsa di vê serdemê de şoreşên proleter pêk hatine. Teva vê li dehan welatan desthiladarî û şoreşên gel ku spartî tifaqa karker, kedkar û burjuvazîya biçûk hatine ava kirin.

Şoreşa jin jî desthiladarîya jinê ji xwe re dike armanc. Lê ev desthiladarî wê tenê ji jinan pêk nayê. Lê ya ku xisleta xwe dide şoreşê bingeh girtina azadîya jinê ye. Şoreşa jin tevahî ciyawazîyên serdestîya mêr ji holê radike xwe bi hedefa avakirina civakeke azadîxwaziya jin ve girê dide.

Şoreşa Cotmehê ya ku li Rûsyayê destpêkirîye û belavî qadên ku di bin dagirkerîya împaratoriya çaritîyê (qeysertîya Rûsyayê) bûye di heman demê de weke şoreşeke jinê jî pêş ketîye. Vê yekê di jîyana civakî û polîtîk de pêşiya jinan vekirîye û ji bo wekhevîya jin û mêr gavên gelekî mezîn avêtîye. Lê bi tecrûbe û zanebûna têkoşîna azadîya jin a wê demê ev şoreş weke şoreşeke jin nehatîye pênasekirin. Ev ne girêdayî asta destkeftinên jin ên di jîyana madî ya şênber e. Girêdayî pênasekirina weke nezerî û rêxistinkirina zanebûnê ye.

Dîyardeya yekemîn ku şoreşa me ya Rojava dike şoreşeke jin zanebûna zayendî ye. Ya duyemîn jî girêdayî vê, di avakirina şoreşa civakî de weke esas parastina vê perspektîfê ye. Encax ji bo pêşxistina şoreşa jin tena parastina zanebûnê têre nake. Di heman demê de pêwîst e ku şertên madî yên civakî biguherin. Ev jî hem weke girêdayî kirde û hem jî ji ber sedema şertên civakî û aborî zehmet e. Ji bo pêşxistina şoreşa jin û şertên madî yên civakî yên wê nêrînên jinên komûnîst wiha ne:

Bingehên Nezerîya Şoreşa Jin a JKŞ û Welatparêzên Sosyalîst

Em ê vê di vê nivîsê de bi şêweya angaştan îfade bikin.

1 – Bingeha serdestîya mêr ji milkê xas pêk tê. Milkê xas hem çavkanîya îstîsmarîya cinsî, hem jî çavkanîya îstîsmarîya çînî ye. Pergala sermiyanê bi serdestîya mêr ve şirîktîya xwe ya yekemîn di parvekirina milk de pêk tîne. Jin hem bêmilk in, hem jî milkê mêran e.

2 – Pergala sermiyanê, her tiştê ku mijara keda hundirê malê dike mijara hilberana pîşesazîyê. Karên wekî paqijî, xwarin, xeyat jî tevlî nav karên pîşesazîyê bûne. Qada hilberînê ya ku aborîya hundirê malê bi “tiştên ku bixwe hildiberîne” pêşwazî dike teng dibe. Ev pêvajo dikare bi du şêweyan pêş ve biçe. An wê tevahî qadên ku dibin mijara keda hundirê malê civakî bibin, yanê xwarin, paqijî û hwd. wê di bingeha civakî de bibin. An jî wê keda jinê wê bibe qada bikaranîn û xizmeta mêr. Encax berê bûyerê mecbûrîyeta civakîbûnê dispêre.

3 – Armanca kapîtalîzmê, hilberana sermiyanê qezenca zêde ye. Û sermîyan her tim ji bo ku vê qezencê zêdetir bike dixwaze ku hêza ku îstîsmar bike weke çendanî zêde bike. Lê ev jî têre nake, di heman demê de ji bo qezenç û reqabetê li hêza kar a erzan digere. Kapîtalîzm vê di nav gundî, jin û beşên neteweyî de dibîne. Jin bi girseyî ji nav aborîya malê derdikevin û bi awayekî girseyî weke hêza kar a erzan tevlî jiyana civakî dibin û bi vî awayî dikevin qada keda civakî.

4 – Avanîya malbatê ya ku spartîye serdestîya mêr berî kapîtalîzmê jî heye. Pergala sermiyanê di bingeha berjewendiyên xwe de veguherîna vê dabîn dike. Lêgerîna sermiyanê ya hêza erzan a kar berdewam dike. Avanîya malbata monogam gelemper dibe. Di alîyê din de tena ne welidandina zarok, karbeşîya kar a zayendperest ku xwedîkirina zarok jî dide ser mil jinê bandor li rewşa hêza kar a jinê ya di bazarê de dike. Hêza kar a mêr serdest dike. Hêza kar a jinê erzan dibe. Ev rewş nakokîya navbera zayendan zêde dike.

5 – Sermiyan qaşo avanîya malbatî ya monogam qebûl dike. Lê ev ji bo jinê wiha ye. Di polîgamîyê de cinsîtîya mêr azad e. Li ber azadîya berdanê ya jinê astengîyên civakî û aborî zêde dibin. Kapîtalîzm cinsîtîya jinê dike kalêr (sermiyan). Cinsîtîya mêr fît dike. Cinsîtîya jinê pêşkeşî xizmeta mêr dike û hîna ji roja yekem de seksê tîne rewşa zagona veşartî ya sermiyanê. Bi vî awayî cinsîtîya jinê dikeve bin serdestîya pergala sermiyanê.

6 – Sedema ku serdestîya mêr a malê berdewamî dike îstîsmarîya zayendperest a mêr e. Wekî ku li jor hat gotin heta ku qada hundirê malê ku di bin serdestîya mêr de ye nayê tesfîyekirin dabînkirina jin û mêr ne gengaz e.

7 – Gelo ji alî mêr ve ev îstîsmarîya zayendperest çawa tê dabînkirin? Di kapîtalîzmê de ev weke mûçeya malbatê tê dîyarkirin. Ji vê re mûçeya hindiktirîn jî tê gotin. Lewma mêr weke kesê ku debara malê dike serdestîya xwe diparêze. Pergala sermiyanê ya serdestîya mêr bi vê rêyê mêrê karker û kedkar jî bi serdestîya mêr ve girê dide. Mêr dike leşgerê malê û civakê. Wayê di vir de pergala serdestîya mêr û têkîlîya mêr bi hev re tê girêdan.

Îro ji kapîtalîzmê serbixwetir pergaleke serdestîya mêr tune ye û nikare hebe. Pergala sermiyanê û serdestîya mêr di nav têkîlîyeke ku nikarin ji hev qut bibin de ne. Hilweşîna pergala serdestiya mêr hilweşîna kapîtalîzmê jî mecbûrî dike. Ji ber vê yekê jinên komunîst têkoşîna li dijî serdestîya mêr weke têkoşîna li dijî kapîtalîzmê digirin dest. Têkoşîna bi tevahî jinên karker û kedkar ku di bin pergala kapîtalîzmê de tên îstîsmarkirin ji xwe re dike hedef. Rizgarîya jinan a ji serdestîya mêr û rizgarîya wê ya civakî girêdayî hev e. Jinên komunîst dibînin ku bi têkoşîna şexsî ya azadîyê rizgarîya jinê ne gengaz e û ji ber vê yekê bangewazîya tevahî jinên karker û kedkar dikin ku rêxistin bibin. Ji bo azadîya jinê têkoşîna li dijî nêrînên ku kirdebûyîn û rêxistinbûnê dixin hemberî hev mecburî dibînin. Kapîtalîzm pergaleke tevahî ye, ji ber vê yekê têkoşîna li dijî kapîtalîzmê jî bernameyeke tevahî dixwaze. Ji ber vê yekê jinên komunîst bangewazîya tevahî jinên karker, kedkar û bindest dike li derdora bernameya komûnîzmê yek bibin û bi vî awayî li dijî serdestîya mêr û kapîtalîzmê têbikoşin.

Di Têkoşîna Jinan De Rûpelek Ji Dîroka Tunusê

Welatê Tunus di navbera salên 1881 û 1956an de di bin mêtîngerîya Fransayê de hat bi rê ve birin. Pergaleke ne wekhev ku civaka Tunusê li gorî kokên nîjadî û olî cuda dike hat avakirin. Lê di vê pêvajoyê de jinên komunîst ên Tunusê bi rêxistina ku avakirin û bi vê rêyê gelekî jin li dijî mêtîngerîyê û ne wekhevîtîyê kirin yek û xeteke enternasyonalîst xêz kirin.

Di heyamên destpêkê de Partîyê Komunîst ê Tunusê ku girêdayî Partîyê Komunîst ê Fransayê bû di destpêka salên 1930an de gelekî xurt bû, êdî hat rewşeke ku karibe xwe bi xwe xebatên xwe bimeşîne. Bi awayekî tundraw azadî û serxwebûna welatê xwe parast û di dîtoka Tunusê de roleke gelekî mezin lîst.

Serkeftina Jinan a Yekemîn

Partîyê Komunîst ê Tunusê di heyamên cuda de rojevên cuda yên têkoşînê dîyar kir. Di salên 1921 û 1922an û piştî wê di salên 1950an de têkoşîna serxwebûnê ya antî emperyalîst û di navbera salên 1930an û 1940an de di xeta antî faşîst de têkoşîn meşand û bi taybetî hewldana rêxistinkirina çîna karkeran da. Lê heta wê demê wekhevîya navbera jin û mêr tu carî nebû daxwazeke navendî. Piştî salên 1945an bangewazîya bikaranîna dengdana gîştî kir, daxwaza wekhevîyê hîna zêdetir şêweyî ma.

Di dawîya sala 1930an de endamên jin ên Partîyê Komunîst ji bo avakirina rêxistina xwe ya jin a xweser dest bi kar kirin. Destpêkê Yekîtîya Jinên Ciwan a Tunusê (UJTF) hat avakirin û di sala 1945an de jî Yekîtîya Jinên Tunusê hat avakirin. Ev gav tenê ne ji bo tevgera sosyalîst û komunîst, ji bo tevahî partîyên sîyasî yên Tunusê jî gaveke yekemîn bû.

Van rêxistinên jinan daxwazên jinan ên rojaneyî kirin mijara têkoşîna xwe ya sîyasî. Vê yekê hişt ku jin di nav civakê de hîna xuyanîtir bibe û bibin îradeyek. Jinên ku heta wê demê ji nav çar dîwaran nikarîbûn derkevin di têkoşîna li dijî mêtîngerîyê bûn kirdeyên pêşeng.

Yekîtîya li Dijî Mêtîngerîyê

Bi taybetî piştî şerê duyemîn yê cîhanê van rêxistinên jinan destpêkê de ji bo şertên jîyana jinan û ji bo daxwazên civakî têkoşînên xurt dan meşandin. Lê di heman demê de di van sazîyan de jin di milê sîyasî, civakî û hwd. de dihatin perwerdekirin. Yek ji taybetmendîya ev têkoşîna jinan jî yekîtîya jinan a li dijî sîyaseta weke olî û nîjadî parçekirina civakê bû. Jinên ji her ol û nîjad an jî netewê di bin siwana van rêxistinan de li dijî mêtîngerîyê bûn yek. Mînak gelekî jinên misilman ku piranîya nifûsa Tunusê pêk dianîn jî tevlî nav refên partîyê komunîst bûn û têkoşîna li dijî mêtîngerîyê mezin kirin. Di heman demê de vê têkoşînê di jîyana civakî ya jinên Yahûdî de jî gelek tişt guhert. Ev guhertina ku di jîyana jinan de çêbû hişt ku pêşdarazî an jî parçebûna navbera gelên ji netew, ol û baweriyên cuda bên şkestin. Di wê demê de bandora partîyê komunîst hîna mezintir bû û rêxistinên jin ên herêmî yên ku daxwazên jinan dikin mijar hîna zêdetir bûn. Bi vî awayî di sedsala 20emîn de jinên Komunîst ên Tunusî bi têkoşîna xwe mohra xwe li dîroka Tunusê xistin.

Dîsa bandora rêxistinên jinên komunîst û têkoşîna wan ji alîyê rejîma Tunusê ve jî rêxistinên cuda jinan tên avakirin.

Jin Partî û Sendîka

Di dîroka sendîkavanîya Tunusudê ji bo jinan û wekhevîya jin û mêr têkoşîneke di asta şoreşê de nehat meşandin. Jin di nav jîyan û xebata û hilberana civakî de hîna zêdetir di qada cawkariyê de cih digirin. Ji salên 1970an pê ve hejmara jinên ku diçûn dibistanê hîna zêdetir bûn. Ev rewş jî di jîyana jinan de bû bingeheke guhertin û bilindbûna zanebûnê. Pêvajoya jinên Mexrîbî bi gelek hêmanan lez bi dest xistibû.

Di heman demê de li Tunusê tevgera misilman jî her ku diçû xurtir dibû, hêzeke berbiçav bi dest xist. Li Tunusê di vê pêvajoyê de li ser pratîkên civakî îslamîbûneke nû hat jiyîn. Vê rewşê bandoreke nû li ser jîyana jinan kir û tevgera jinan vê carê têkoşîna xwe di du alîyan de meşdand. Yekemîn li dijî rejîma paşverû û serdestîya mêr, ya duyemîn têkoşîna li dijî paşverûtîya îslamê.

Şepêla Tevgera Jinan a Piştî 1970an

Di salên 1978an de "Rêxistina Rewşa Xebata Jinan" a Tunusê tê avakirin û heta sala 1985an di nav jinan de têkoşîneke gelekî mezin dide meşandin. Ev têkoşîn jî dibe bingeha tevgerên femînîst ên Tunusê. Di sala 1985an de kovara jin a bi navê Nissa tê çapkirin. Kovara Nissa di milê ragihandinê de ji bo xurtkirina rengê jinê roleke girîng dilîze. Van tecrûbeyên hişt di van salan de jinên Tunusî hin destkeftinan bi dest bixin.

Di Serhildanên 2011an de Tevlîbûna Jinan

Di sala 2011an de li Tunusê li dijî dîkdatorîya Zeynel Abîdîn Bîn Alî û li dijî bêkarî û feqîrtîyê ciwanekî bi navê Muhamed Buazuzî agir bi bedena xwe xist. Agirê bedena Muhamed buazuzî bû bingeha teqîna hêrsê karker, kedkar û jinan. Di encama vê serhildanê de di Rojhilata Navîn de dîkdatoriyên 30-40 salan hilweşîyan. Lê li vir tiştê herî girîng yê ku bê anîn ser ziman beşa civakî ya destpêkê de ketin tevgerê û bûn çirûska şoreşê jin bûn. Jin tena ne ji bo mafên jinan, bi mîlyonan jin di heman demê de ji bo azadîya polîtîk, azadîya cinsî, çalakî û rêxistinbûnê jî daketin kolanan. Jinan bi taybetî bi dirûşmeya "Ger Wekhevî Tune be Demokrasî jî Tune ye" tevlî çalakîyan bûn. Jinên ciwan ên Tunusî jî di heman demê de bi daxwazên azadîya polîtîk û azadîya cinsî tevlî van serhildanan bûn.

Lê Mixabin her çiqasî ku di encama ev serhildana ku li Tunus destpêkirî û piştî wê derbasî Misir, Yemen, Lîbya, Sûrî, Fas, Tirkiye û hwd. bû, ji bo lawazbûna pêşengtî û bernameya şoreşger, bi mudaxeleyên dewletên emperyalî ji nû ve hatin zivirindin hikûmetên paşverû. Daketina bi mîlyonan gelên karker, kedkar, jin û ciwanan di heman demê de bingeha ji ev têkoşîna dîrokî digire. Lê mixabin ji ber lawaztîya pêşengê komunîst û bernameyeke şoreşger ev teqîna civakî ku bu bingeha hilweşîna dîkdatorîya paşverû nikarîbû bigêhêje asta serkeftina şoreşê.

Di vir de girîngîya pêşengê şoreşger, komûnîst û bernameyeke şoreşger careke derdikeve holê. Piştî ku agirê serhildanên gelê Ereb vemirî û bi taybetî bi piştgirîya Emerîka di van welatan de hikûmetên paşverû yên serdestîya mêr hatin avakirin di gelek milan de destkeftinên jinan hatin çewisandin. Lê em dikarin bêjin ku şoreşa ku li Tunusê destpê kir û jin bûn pêşengê wê dîsa li Rojava bi pêşengtîya jinan weke şoreşeke jin hat tacîdar kirin. Her şoreşek ji bo şoreşa piştî xwe dibe hêz û çavkanî.

KOBANÊ -
Yasmin Elî

Merhaba, Ez serî de di şexsê Ş.Çîçek Jiyan de şehîdên HRK û tevahî şehîdên Rojava bi bir tinim. Ş.Çîçek ji Kobanê bû, ji bo rizgariya Efrînê şehîd ket. Cenazêyê Ş.Çîçek di destê çeteyên Dewleta Tirk de işkence dîtîye. Ew rastîya dewleta Tirk û çeteyên xwe ye. Dewleta Tirk êriş li ser cenazeyên gerila, leşkera jî dike. Taybet bedene jinê teşhir dike. Ji berk û dewleta Tirk dewleta faşîst û hemû dewletan faşîst zordarîya jinen dikin.

Dewleta Tirk rojanê êrîşa li axa Rojava dike. Cihê mazot, cihê kehrebe, nexweşxane di bin êrîşê dewleta Tirk de ne. Dewleta Tirk dixwaze gelê me perîşan bike. Di êrîşa dewleta Tirk a mêtîngêr de herî zêde Jinên Rojava zordarî dibînin. Di şêr de jîyana jinê betir zehmet dibe. Dema kehrebe tune be, mazot tune be yan jî bi sedemê êrîşê çeteyên de gel koçber bibe herî zahmet jinan re ye.

6 sala berî dewleta Tirk êrişêaEfrînê kir. Piştî şer çeteyên dewleta Tirk ketin Efrînê. Li Efrînê piştî dagirkirinê bi hezaran jin hatin ravandin, tecawûz ditin. Jinên Efrinê rojanê di bin tehdita kuştinda ne. çeteyên dewleta Tirk dizî dike, talan dike, êrîşa li ser mal û malbatan Efrînê dikin. Jinên Efrînê piştî dagirkirinê koçber bûn. Di qempê de jîyan zahmet e. Taybet zivistanê dinya sar dibe, ba û baran heye, mazot tune. Di havinê de ava paqij tune ye, nexweşî derdikevin. Jinên ku li Efrînê man rewşê wan hîn xirabtir e. Çete rojane êrîşa jinan dike. Ji berk u faşîzm êrişa li ser ax û bedene jinê yek dibîne. Piştî dagirkirina Efrînê çend jin li Efrînê bi işkence re hatin kuştin.

Koçberên Serê Kanîyê û Girê Spî jî di eynî rewşê de ne, li kampê jiyan pir zahmet e. Heremên ku hat dagirkirin, li vir de jin ne azad in. Nikarin derkevîn derve, kar û xebata xwe wekî berî bikin. Dewleta Tirk li Serê Kanîyê û Girê Spî bi taybet dixwaze demografîya Efrînê biguherîne. Zarokên Efrînê asîmîle dike. Zarok Di dibistanan de de zimanê Tirkî fer dibin. Ji bo jinên Efrînê sazî hatiye vekirin ku di wê sazîyê de jin fêrî çanda Tirkan dibin. ENKSê di vir de destê dewleta Tirk digirê û bi wan re bi hev re tev digere. Lê çeteyên ku êrişa jinan dikin ji bo wan ceza tune ye. Tu mafê jinê li Efrînê nemaye. Çeteyên dewleta Tirk bê sedem dikarîe idam bike,kuştin bike, işkence bike. Her cureyên zordari li ser bedene jinê ji xwe re heq dibînin.

Em weke jinên komunîst êrîşa li ser Rojava qabûl nakin. Em dixwazin Efrîn û herêmên ku hatin dagirkirin êdî rizgar bibin. Em jinên Rojava li ser axa xwe ya rizgar dixwazin bi awayekî azad bijîn. Ji bo vê em li dijî dewletên Tirk a dagirker in. Em dizanin ku êrişa li ser şoreşa Rojava êrîşa li ser jinan e. Ji bo vê Li dijî Erîşê dewleta Tirk em şoreşa xwe diparêzin û axa xwe bernadin. Weke Çîçek, weke Barîn weke Arîn û Sarya em xwe rêxistin bikin, li dijî dagirkeran, li dijî dewletên emperyal şoreşa xwe biparêzin. Wê Teqez Efrîn rizgar bibe, teqez Serê Kanîyê û Girê Spî vegere rojên azad. Serkeftin a me ye.

Bijî şoreşa Rojava, bijî şoreşa jinê!



HESEKE-
Wîdad Mihemed

Tundîya li ser jinê di dîrokê de dîyardeya têkîlîyên desthiladarîyê yên newekhev e di navbera jin û mêran de, ev tişta hevpar e û bûye sedem ku zilam serdestiya jinan bike û cihêkarîyê li jinan bike û rê li ber pêşketina tevahî bigire. mekanîzmayên ku jin di pozîsyona bindestîya mêr de li ser jinan tên ferzkirin û rastî tundîya fizîkî, derûnî, devkî, aborî, civakî û sîyasî tê Li welatên kapîtalîst jin rastî cureyên din ên şîdet û cudakarîyê tên, ku tundîya du alî bi kontrola dewletê ya li ser çînên bindest ên jin û mêr diyar dibe û paşê mêr jî tundîya zayendî li dijî jinan pêk tînin ku li herêmên Rojhilat, Rojava, Bakur û Başûrê Kurdistanê hegemonyaya mêr temsîl dikin, ew sîstemên ku xwe dispêrin îstîsmarîya jinê Tundîya li ser wan tê kirin, azadîya jinan sînordar dike û nahêle ku mafên xwe bi kar bînin, rastî gelek sûcên kuştin, destavêtin, tacîz û lêdanê tên. Tundîya li ser jinan ji dema şer û nebûna ewlekarî û aştiyê berbelavtir e. Ji her cure bêedaletî û zilmê re bêtir mexdur in. Dagirker sûcên herî gemar bi taybetî li dijî jinan dike û ev yek di kiryarên dagirkerîyê de dîyar dibe. Tirkî li herêmên Li Rojava ku rejîma desthiladar, rejîma faşîst a Partiya Dad û Geşepêdanê li Tirkiyeyê, fikra şoreşa Rojava û azadîya jinê red kir û pêvajoya şoreşê veguherî şoreşeke berfireh a li hemû herêmên Sûriyeyê. û heta herêmên Îranê û azadkirina jinan ji destê rejîma faşîst a meleyên Îranê, şoreşa jinan, şoreşa "jîyana azad a jinan" Dagirker ji jinan ditirse û jinan hêjayiyaye xwe di Li qada şoreşê, tevî vê yekê jî jin weke mexlûqên qels tên dîtin.

QAMIŞLO-
Arîn Efrîn Qamişlo

